**Li Tirkîyeyê du hefteyên dawîn**

**1-15 ÎLONÊ, 2023**

## 1ê ÎLONÊ, 2023

### Zanîngeha Bogaziçiyê der barê 13 endamên hîndekariyê de lêpirsîn da destpêkirin



Rektoriya Zanîngeha Bogazîçiyê der barê 13 endamên hîndekariyê de ku li Qada Başûr di dema bêhnvedana xwarinê de beşdarî çalakiya 15 deqîqeyan a "bêdengiyê" bûn de lêpirsîn da destpêkirin. Bi vê çalakiya bêdeng û aştiyane, akademîsyen armanc dikin ku pêkanînên ku zirarê dide avahiya xweser, azad û demokratîk a zanîngehê protesto bikin û hişyariya raya giştî bilind bikin.

Rektoratiyê îdia kir ku ev kiryar "der-qanûnî" ye û "xebata zanîngehê xera dike". Xwepêşandanên ku bi tayînkirina Melîh Bulu ya wekî rektor dest pê kirin ji 4ê Çileya 2021an û vir ve berdewam dikin.

*Cumhuriyet - https://www.cumhuriyet.com.tr/turkiye/bogazicili-akademisyenlere-universiteden-sorusturma-suclari-demokratik-universite-istemek-2114850*

*Gazete Oksijen - https://gazeteoksijen.com/turkiye/bogazicindeki-sessiz-protestoya-katilan-akademisyenlere-disiplin-sorusturmasi-187832*

## 2ê ÎLONÊ, 2023

### Di hevdîtin û rûniştina Dayikên Şemiyê ya hefteya 962yem de 32 kes hatin binçavkirin



Polîsên ku çalakiya rûniştinê ya Dayikên Şemiyê ya 962yem asteng kirin, 32 kes binçav kirin. Girtî, piştî 5 saetan, li dû kontrola tenduristiyê ya li sê nexweşxaneyên cuda hatin berdan. Ji meha Nîsanê û vir ve zêdeyî 600 kesî di çalakiya rûniştinê ya li Qada Galatasarayê û gelek bajarên din de bi darê zorê hatin binçavkirin. Rojnamegerên ku çalakî şopandin jî her tim rastî astengî û tundiyê hatin.

Qeymeqamiya Beyoglûyê ya Stenbolê bi hinceta “Ti agahî nehatiye dayîn” civîn û çalakiya rûniştinê ya 700emîn a Dayikên Şemiyê ku wê di 25ê Tebaxa 2018an de li Qada Galatasarayê ya Kolana Îstîklalê bihata lidarxistin, qedexe kiribû. Polîsan bi gaza îsotê û fîşekên plastîk êrîşî kesên ji bo çalakiya rûniştinê li qadê kom bûne û yên

li derdorê bûn kirin û 23 kes binçav kirin. Di mudaxaleya polîsan de milê Aydin Aydogan şikest û gelek fîşekên lastîkî li bedena wî ketin. Piştre der barê 46 kesan de bi îdîaya “dijberîkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan” doz hat vekirin.

Aydogan, yek ji xizmên windayan Maside Ocak û parêzvana mafan Leman Yurtsever der barê midûr û wezîfedarên hiqûqê de danezana sûcê kirin, lê ji aliyê dadgehê ve hat redkirin. Îtirazên der barê redkirinê hatin redkirin. Li ser vê yekê Aydogan û Ocak bi takekesî serî li Dadgeha Makezagonê da.

Dadgeha Makezagonê di Sibata 2023an de biryar da ku "mafê organîzekirina civîn û xwepêşandanan" ya ku di xala 34an a Makezagonê de hatiye tertîbkirin, hatiye binpêkirin. Biryar hat dayîn ku 13 hezar û 500 TL zirara madî bide Masîde Ocak. Dadgehê di biryara xwe ya der barê serlêdana Aydogan a meha Nîsanê de diyar kir ku polîsan “qedexeya muameleya xerab binpê kiriye" û biryar da ku 60 hezar TL tazmînata manewî ji Aydogan re bê dayîn û polîsên navborî bên darizandin.

Di meha Çileyê de, di doza serlêdana takekesî ya Sebla Arcan Tatlav a yek ji Kesên Şemiyê ku di çalakiya 22ê Îlona 2018an de li Qada Galatasarayê rastî tundiya polîsan hat, Dadgeha Makezagonê diyar ku “qedexeya muameleya xerab, mafê organîzekirina civîn û xwepêşandanan û qedexeya îşkenceyê” hatine binpêkirin û biryar da ku 50 hezar TL tazminata manewî bo Tatlavê bê dayîn.


Tevî van biryarên Dadgeha Makezagonê jî polîs bi zorê û bi binçavkirinan nahêlin parêzvanên mafan li Galatasarayê kom bibin û çalakiya rûniştinê pêk bînin û daxuyaniyên çapemeniyê bidin.

*T24 - https://t24.com.tr/video/cumartesi-anneleri-nin-962-nci-hafta-bulusmasinda-32-kisi-gozaltina-alindi,56257*

*Diken - https://www.diken.com.tr/cumartesi-anneleri-eylemindeki-polis-siddetine-aymden-ihlal-karari/*

*Gazete Duvar - https://www.gazeteduvar.com.tr/aymden-cumartesi-annelerine-polis-saldirisina-eziyet-yasaginin-ihlali-karari-haber-1599323*

**Doza Serokê Berê yê Baroya Diyarbekirê û Parêzvanê Mafên Mirovan**



Serdozgeriya Komarê ya Diyarbekirê der barê Serokê berê yê Baroya Diyarbekirê Parêzer Mehmet Emîn Aktar de doz vekir.(Qanûna têkoşîna li hember terorê de 6/1) İdia ew e ku Aktar, "di lêpirsîneke dijî rêxistina terorê de Serdozgerê Komarê bi rêya ku agahiyên nasnameya wî bi awayekî eşkere weşandiye wekî hedef nîşan daye.

Di operasyona ku di 25ê Nîsana 2023an de li Amedê 216 kes hatin binçavkirin, di nav wan kesan de rojnameger û hiqûqnas jî hebûn. Parêzer Aktar tevlî lêgerîna li buroya Parêzer Resûl Temur bû û li ser hesabê xwe yê medyaya civakî rapora der barê neheqiyan de parve kir. Bi hinceta ku navê dozger di protokolê de cih girtiye der heq Aktar de doz hat vekirin. Yekemîn danişîna dozê dê di 14ê Kanûna 2023an de li 5emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê pêk were.

Nûçegihanê Ajansa Mezopotamyayê Firat Can Arslan li ser Twîtterê der barê heman dozger û hevjîna wî ya dadger de ku ji Amedê bo Samsun Vezîrkopruyê hatibûn tayînkirin de tiştin parve kiribûn. Rojnameger Arslan bi

vê hincetê di 25ê Tîrmeha 2023an de ji ber parvekirinên xwe hat binçavkirin û girtin. Rojnamegerên ku parvekirinên Arslan ê medyaya civakî retweet kirin: Edîtora Bîanetê Evrîm Kepenek, edîtora T24ê Sîbel Yuksekler, rojnameger Evrîm Denîz û nûçegihana Ajansa Mezopotamyayê Delal Akyuz jî di çarçoveya heman lêpirsînê de hatin binçavkirin.

*BİANET - https://bianet.org/haber/diyarbakir-barosu-eski-baskani-aktar-a-savciyi-hedef-gosterdigi-suclamasiyla-dava-283358*

**3ê ÎLONÊ, 2023**

**Lêkolîna Disîplînê ya li Xwendekarên Zanîngehê di derbarê Ala Keskesorê de**



Rektoriya ODTUyê (Zanîngeha Teknîkî ya Rojhilata Navîn) der barê du xwendekaran de lêpirsîna dîsîplînê da destpêkirin. Xwendekaran di merasima mezûniyetê ya ku di Tîrmeha 2023an da li Stadyuma ODTUyê hat lidarxistin de ala keskesorê vekiribûn. Di teblîxa ku ji xwendekaran re hat şandin de wiha hat gotin: “Hatiye tespîtkirin ku di 26ê Tîrmeha 2023an de di derdora saet 19.40an de, di merasîma bawermedniyê de ku li stadyuma ODTUyê hat lidarxistin de wan bi ala LGBTyê ku di çenteyê xwe de anîne dest bi meşa girseyî kirine." Lê belê ji bo lêpirsînê tu maddeya rêziknameya dîsîplînê wek bingeh nehat nîşandan.

Derket holê ku di 6ê Îlona 2023an de der barê 3 xwendekarên din de jî lêpirsîn hatiye vekirin.

*Artı Gerçek - https://artigercek.com/lgbti/odtulu-iki-ogrenciye-gokkusagi-bayragi-sorusturmasi-263875h*

*BİANET - https://bianet.org/haber/odtu-mezuniyetinde-lgbti-bayragi-acan-ogrencilere-ikinci-sorusturma-283638*

**Girtiyê nexweş Hulki Guneş tevî ku cezayên wî hatine rakirin jî nayê berdan**

Girtiyê bi navê Hulki Guneş ku di Girtîgeha Tîpa Tyê ya Hêjmar 4 ya Şakranê de ye, tevî ku salek di ser berdana wî ya bi şert re derbas bûye, ji ber cezayên "dîsîplînê" yên beriya niha lê hatiye birîn, tê astengkirin. Di sala 1992an de di pevçûna ku li navçeya Gimgimê ya Mûşê pêk hat, leşkerek hat kuştin. Li dû pevçûnê Hulki Guneş hat binçavkirin. Di encama doza ku ji aliyê Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Diyarbekirê ya Hêjmar 1 (DGM) de bi îdiaya "Xerakirina yekîtiya dewletê û bitûniya welatî " cezayê muebbetê lê hat birîn.

Guneş ê ku ji ber îşkenceya li girtîgehê bi nexweşiya Ankilozan Spondilit û nexweşiya pişikê ket, di lîsteya girtiyên nexweş a Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) de cih digire.

*Evrensel - https://www.evrensel.net/haber/498197/hasta-tutuklu-hulki-gunes-kaldirilan-cezalara-ragmen-tahliye-edilmiyor*

Özgür Politika - https://www.ozgurpolitika.com/haberi-cezalar-kaldirildi-tutsaklik-suruyor-180905

**4ê ÎLONÊ, 2023**

### Îşkence li Mûşê



Muhammed Erolê ku li gundê Sunguyê yê bi ser navenda Mûşê di serdegirtina mala xwe de hat binçavkirin, li Fermandariya Cendirmeyan a Parêzgehê rastî îşkenceyê hat. Parêzer Tarık Guneş, anî zimên ku piştî rapora destdirêjiyê dê serlêdana sûc bikin.

Erol ê ku di serdegirtinê de bi îdiaya ku kinif tê çandin hat binçavkirin, birin Fermandariya Cendirmeyan a Navendî ya Mûşê. Li wir îşkence lê hat kirin û ji laşe wî gelek cih şikestin. Cendirmeyan îdia kirin ku Erol di dema binçavkirinê de bertek nîşan daye û kêr li wan kişandiye. Erol piştî îfadeya li dozgeriyê bi hinceta "Ji bo pêkneanîna erke, li berxwe daye" bi daxwaza girtinê sewqî Dadgeha Cezayê Sulhê ya Mûşê hat kirin. Serdozgeriyê daxwaza girtinê red kir, Dadgeha Cezaya Sulhê ya Mûşê bi qedexeya derketina derve û şertên kontrola edlî Erol serbest berda.

*Gazete Duvar - https://www.gazeteduvar.com.tr/musta-jandarmadan-iskence-sabaha-kadar-darp-ettiler-haber-1636119*

*Rûdaw - https://www.rudaw.net/turkish/middleeast/turkey/0409202312*

*Artı Gerçek - https://artigercek.com/guncel/musta-karakolda-iskenceye-suc-duyurusu-askerler-beni-soguk-suyla-ayiltip-tekrar-264221h*

### Darazdana Rojnamegerî ku di şopandina nûçeyan de hat binçavkirin



Nûçegihanê Ajansa Mezopotamyayê Ergîn Çaglar dema ku "Meşa Gemlîkê" ya di Hezîrana 2022an de li Bûrsayê pêk hat dişopand hatibû binçavkirin. Bi hinceta “dijberîkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan” doz lê vebû. Doza wî di 4'ê Îlonê de li 58emîn Dadgeha Cezayê Asliyê ya Stenbolê dewam kir.

Dadgerê ku îdianame xwend bi gotina “Em bi çi re mijûl dibin” heyra xwe nîşan de. Li ser wê yekê Çaglar got, “Me gelek xwepêşandan şopandin. Ez jî matmayî mam ku ev bûyer veguherî dozê." Çaglar, îfadeyên xwe yên li midûriyeta polîsan dubare kir, anî ziman ku ew ne wekî çalakvanek, wekî rojnamegerekî di meşe de bûye û tevî ku karta xwe ya çapemeniyê hem li qadê û hem jî li qereqolê nîşan daye hatiye binçavkirin.

Piştî parastinan, dadger ji Çaglar re got, “Heqê te hebû ku tu wekî çalakger jî li wir bûya. Her wiha ji ber ku xebatên te yên pîşeyî hatine astengkirin û tu hatiyî binçavkirin, mafê te heye ku daxwaza tazmînatê bikî û giliyê polîsan bikin.” û mafên wî yên bingehîn bi bîr xist. Dadgehê bi biryara bêhiqûqiyê dosya ji 29emîn Dadgeha Cezayê Asliyê ya Bûrsayê re şand.

*Gazete Duvar - https://www.gazeteduvar.com.tr/eylem-takip-eden-gazeteciye-acilan-davanin-hakimi-nelerle-ugrasiyoruz-haber-1636054*

**6ê ÎLONÊ, 2023**

**Ji Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê piştgiriya bo Mîtînga Dij LGBTI+**

Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê (RTUK) pejirand ku ji bo çalakiya Weqfa Malbatê ya Stenbolê ku dê bi sernavê "Propagandaya LGBTiyan Rawestîne" di 17ê Îlona 2023an de li Stenbolê bihata lidarxistin daxuyanîyek ji raya giştî re bê amadekirin.

Vîdyoyek bi heman rengî wekî daxuyaniya ji raya giştî re beriya meşên di sala 2022an de hate weşandin; Komeleya Kaos GL li dijî biryara RTÜKê doz vekir.

*SES Eşitlik, Adalet, Kadın Platformu - https://esitlikadaletkadin.org/rtuk-lgbti-karsiti-kamu-spotuna-onay-verdi/*

**7ê ÎLONÊ, 2023**

**Endamê Dadgeha Makezagonê giliyê du rojnamegeran kir û derketina wan a derveyî welêt hat qedexekirin**

Endamê Dadgeha Makezagonê (AYM) Îrfan Fîdan der barê nûçeyekê de gilî kir, di doza ku li ser giliyê wî vebû de derketina derve ya du rojnamegeran hat qedexekirin. DÎSK Basin-Îşê ev biryar li ser medyaya civakî eşkere kir.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Ji ber nûçeyeke di Gerçek Gundemê de hat weşandin, Endamê Dadgeha Makezagonê Îrfan Fîdan gilî kir û derketina derve li serokê me Faruk Eren û rojnameger Furkan Karabay hat qedexekirin. "Em ê pîşeya xwe li hemberî van hewldanan biparêzin."

*DİSK Basın-İş – Twitter - https://x.com/Disk_Basin_is/status/1699438452310147088?s=20*

*MLSA - https://www.mlsaturkey.com/tr/irfan-fidanin-sikayetiyle-gazeteci-eren-ve-karabaya-hedef-goesterme-davasi*

**8ê ÎLONÊ, 2023**

**Muzikjen hat binçavkirin**

Muzîkjen Kadîr Çat piştî konsera ku ji aliyê Meclîsa Ciwanan a Partiya Çep a Kesk a Rihayê ve hat lidarxistin, hat binçavkirin.

Çat bi hinceta ku bi strana ku li Haliliyeya navçeya Şanliurfayê li salona dawetê gotiye "propagandaya terorê" kiriye birin Midûriyeta Emniyetê ya Şanliurfayê. Çat piştî kontrola tenduristiyê hat berdan û diyar kir ku di sala 2010an de li Rihayê, di sala 2023an de jî li Aydinê der barê heman stranê de îfadeya wî hatiye girtin û ji sûcdarkirinan beraat kiriye.

*Rudaw - https://www.rudaw.net/turkish/middleeast/turkey/080920234*

*Susma24 - https://susma24.com/gozaltina-alinan-muzisyen-kadir-cat-serbest-birakildi/*

**9ê ÎLONÊ, 2023**

## Darizandina giyabî û daraza girtîgehê ji bo rojnamevan



Midûrê giştî yê weşanê yê Rojnameya Avrupa ku li Qibrisê rojane tê weşandin Şener Levent ji ber gotara xwe ya bi navê "Kurd û em" li Tirkiyeyê giyabî hat darizandin. Bi hinceta ku "Heqaret li Serokomar kiriye (TCK 299)" 11 meh û 20 roj cezayê girtîgehê li Şener hat birîn.

Biryara ku di 10ê Adara 2023an de hat dayîn, encax di meha Tebaxê de ji Levent re hat ragihandin. Levent di gotara xwe ya 9ê îlonê de bêyî ku agahiyên dadgeha ku biryar daye par ve bike encam eşkere kir û rexne kir.

Ji ber karîkatureke ku di 8ê Kanûna 2017an de li rojnameya Afrikayê (navê rojnameya Avrupa yê berê) weşandibû, hem li Qibris û hem jî li Tirkiyeyê doz hat vekirin. Di doza li Qibrisê de beraat kir, ji aliyê Dadgeha Cezayê Asliyê ya 63yemîn a Enqereyê ve salek cezayê girtîgehê li Levent hat birîn û ev ceza jî bû 9 hezar TL cezayê pere yê edlî. Xebatkarên rojnameya Afrîkayê ji ber karîkaturê rastî hewldana lîncê hatibûn. (https://tinyurl.com/2dm4vyu5)

*BİANET - https://bianet.org/haber/kibrisli-gazeteciye-turkiye-de-cumhurbaskanina-hakaret-cezasi-283925*

## Di pêşandana fîlmî de binçavkirin




Li Parka Muhlis Akarsu ya Taxa Înonû ya Gebzeyê, nîşandana fîlmê Pardon ku ji aliyê Partiya Komunîst a Tirkiyeyê (TKP) ya Taxa Azadiyê ya Kocaeliyê ve hat lidarxistin, ji aliyê polîsan ve hat astengkirin. 13 endamên TKPê hatin binçavkirin.

Fîlmê Pardon di sala 2005an de ji aliyê Ferhan Şensoy ve hatiye nivîsandin û derhêneriya wê Mert Baykal kiriye. Piştî nişandan dest pê kir, ekîbên polîsan hatin taxê, pêşandan rawestandin û 13 kes binçav kirin. Fîlm çîroka 3 hevalên ku di encama şaşfêmkirinekê de hatibûn binçavkirin vedigot.

*Sanat Özgürlüğünü İzleme Platformu - https://www.reportare.com/soz/haber/pardon-filmi-gosterimine-gozalti/*

Diken - https://www.diken.com.tr/pardon-filmi-gosterimine-gozalti/

**12ê ÎLONÊ, 2023**

**Li Şirnexê, Ketina 14 herêman ji bo 15 rojan hat qedexekirin**

Walîtiya Şirnexê ragihand ku 14 herêm wekî "herêma ewlekariya taybet" hatiye destnîşankirin û ketina wan herêman ji bo 15 rojan hatiye qedexekirin.

Sedema vê biryara qedexeyê wisa hat ragihandin: "temînkirina ewlekariya neteweyî, parastina nîzam û ewlekariya giştî, pêşîgirtina li sûc, parastina maf û azadiyên bingehîn, maf û azadiyên kesên din û nîzama giştî, pêşîgirtina li bûyerên tundiyê û pêşîgirtina li her rewşa neyînî ya ku dibe ku çêbibe."

*Walîtiya Şirnexê – http://www.sirnak.gov.tr/yasaklama-karari-12092023*

*Cumhuriyet - https://www.cumhuriyet.com.tr/turkiye/sirnakta-14-bolge-gecici-ozel-guvenlik-bolgesi-ilan-edildi-2118738*

*Gazete Duvar - https://www.gazeteduvar.com.tr/sirnakta-14-bolgeye-girisler-yasaklandi-haber-1637370*

**Der barê endamên Kolektîfa Sînemayê ya BEKSAVê de, ku pêşandana fîlmê "Pride" hatibû qedexekirin, doz hat vekirin.**

Kolektîfa Sînemayê ya Weqfa Lêkolînên Zanist Estetîk Çand û Hunerê (BEKSAV) di çarçoveya çalakiyên Meha Serbilindiyê ya 2023an de di 7ê Hezîranê de li Kadikoya Stenbolê de bo pêşandana filmê “Pride” ku ji aliyê Qeymeqamtiya Kadikoyê ve hatibû qedexekirin hatin gel hev. Polîsan pêşandan asteng kirin û heşt kes hatin binçavkirin. Der barê heşt kesên ku hatibûn binçavkirin de doz hat vekirin.

*KAOS-GL - https://kaosgl.org/haber/birlikte-bir-film-izlemek-istedigimiz-icin-yargilanmak-istemiyoruz*

**13ê ÎLONÊ, 2023**

**Walîtiyê konsera bo hevgirtina xebatkarên FEDAŞê asteng kir**




Walîtiyê konsera ku dê di roja 35emin a greva karkerên FEDAŞê de li Qada Seyît Riza ya Dêrsimê bihata lidarxistin asteng kir. Serokê Giştî yê Enerjî Senê Suleyman Keskin li qadê daxuyanî da. Piştî daxuyaniyê karkerên ku berxwedana xwe berdewam kirin, hunermendên ku dê beşdarî konserê bibûna û welatiyên beşdarî daxuyaniyê bûn ji bo karkerên li Zonguldakê di cinayeta kar de jiyana xwe ji dest dan klama bi navê "Madenci" gotin.

Firat Elektrîk Belavkirin (FEDAŞ) A.Ş. ku sazgeha Kazancı Holding A.Ş. ye ji 31ê Kanûna 2010an û vir ve elektrîkê li parêzgehên Elezîz, Meletî, Çewlik û Dêrsimê belav dike.

*Evrensel - https://www.evrensel.net/haber/498878/fedas-iscilerinin-dayanisma-konseri-engellendi-isciler-tepki-gosterdi*

**Daxwaza girtina Platforma Em ê Kuştina Jinan Rawestînin hat redkirin**




Doza ku bi hinceta “Armanca parçekirina malbat û civakê dike” ji bo girtina Komeleya Platforma Em ê Kuştina Jinan Rawestînin hatibû vekirin di 13ê Îlona 2023an de bi dawî bû. 13emîn Dadgeha Cezayê Asliyê ya Stenbolê doz red kir.

*BBC Türkçe - https://www.bbc.com/turkce/articles/czv728zr109o*

**14ê ÎLONÊ, 2023**

**Darizandina rojnamegerên girtî dewam dike**



Doza der barê nûçegihanên Ajansa Mezopotamyayê Abdurrahman Gok û Mehmet Şah Oruç de pênc meh piştî girtina wan di 14ê Îlona 2023an de dest pê kir.

Derbarê rojnameger Gok de (di 27ê Nîsana 2023an de hat girtin) bi hinceta "endamtiya rêxistina derqanûnî (TCK 314/2)" û "propagandaya rêxistina derqanûnî (TMK 7/2)" heta 20 salan cezayê girtîgehê hat xwestin. Gok di rûniştina li 5emîn Dadgeha Cezayê Giran a Diyarbekirê de wisa got: "min wêneyên Kemal Kurkut ê di Newroza 2017an de ji aliyê polîsan ve hat qetilkirin kişand. Piştî ku min wêne belav kirin pênc caran der barê min de lêpirsîn hat vekirin. Dema ku li dû wêneyan der barê polîsan de doz hat vekirin zext zêde bûn. "Ez difikirim ku sedema rastîn a vê dozê wêneyên Kemal Kurkut in ku min kişandine."

Abdurrahman Gok ji dema ku di pîrozbahiya Newroza 2017an a Diyarbekirê de wêneyên qetilkirina Kemal Kurkut kişandiye, rastî zextan tê. Bi saya wêneyan daxuyaniya Walîtiya Amedê ya "Kurkut ji ber ku bombeya zindî bû hat gulebarankirin" betal bû. Piştî bûyerê di 20ê Nîsana 2017an de polîsan bi ser mala Gok ve girt. Der barê wî de bi îdiaya "endamtiya rêxistinê" û "propagandaya rêxistinê" doz hat vekirin. 5emîn Dadgeha Cezayê Giran a Diyarbekirê bi hinceta "propagandayê" salek û 6 meh û 22 roj cezayê girtîgehê li Gok birî.

Gok di 9ê Cotmeha 2018an de di çarçoveya "Lêpirsîna KCKê" ya li Diyarbekirê tevî gelek rojnamegeran hatibû binçavkirin. Hat îdiakirin ku Gok "di nava komîteya çapemeniyê ya KCKê de tevdigere". Gok di 12ê Cotmeha 2018an da di bin kontrola edlî de hat berdan. Li dû berdana wî bi qasî 2 salan, îdianameya der barê wî de, temam bû. Bi îdiaya “Endamê rêxistina terorê ya çekdar e” û “Bi rêya çapemeniyê propagandaya rêxistina terorê kiriye” hat sûcdarkirin. Dozgeriyê ji bo Gok ji 9 sal û 4 meh û 15 rojan heta 28 sal û mehek û 15 rojan cezayê girtîgehê xwest. Doz berdewam e.

Umît Akbiyik ku piştî ku ji poşmaniya bi bandor sûd wergirtiye, wekî şahidê eşkere di îddianameya doza derbarê Gok de îfade daye. Abdurrahman Gok, li hemberî îfadeyên wî bertek nîşan da û got, “Dibêje ez di PEL

produksüyonê de  de dixebitim. Ez li wir nexebitîme, li ser îfadeyên wî yên derew ez hatim girtin." Doz dê di 5ê Kanûna 2023an de berdewam bike.

*BİANET - https://bianet.org/haber/tutuklu-gazeteci-abdurrahman-gok-e-tahliye-yok-283978*

Doza der barê nûçegihanê Ajansa Mezopotamyayê Mehmet Şah Oruç ê ku li Amedê bi 10 rojnamegeran re hat binçavkirin û di 25ê Nîsana 2023an de hat girtin, di heman rojê de li 2yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Bedlîsê dest pê kir. Oruç bi rêya Pergala Deng û Dîmenê (SEGBÎS) ji Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Hejmar 1  a Diyaerbekirê tevlî parêzerê xwe Resûl Temur beşdar bû û diyar kir ku ew îtîrafkar Ûmît Akbîyik nas nake. Dadgehê biryara berdewamkirina girtina Oruç da û danişîn taloqî 31ê Cotmeha 2023an kir.

*BİANET - https://bianet.org/haber/tutuklu-gazeteci-mehmet-sah-oruc-da-tahliye-edilmedi-284026*

**Doza qetlîama Sêwasê demborî bû**




Di doza qetlîama Sêwasê de ku sê bersûcên firar  dihatin darizandin de, dadgehê bi hinceta demborîbûnê biryara betalkirina dozê da.

Bersûcên firar Murat Sonkur, Eren Ceylan û Murat Karakaş bi hinceta ku di 2ê Tîrmeha 1993an de li Otela Madimak a Sêwasê  33 kes bi rêya şewitandinê qetil kirine dihatin darizandin.  Doza wan li 1emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê hat dîtin.

Di dozê de biryara ewil di sala 1994an de hat dayîn. Dadgehê  dema li 87 bersûcan ji 2 salan heta 15 salan cezayê girtîgehê birî, "Kêmkirina tehrîka neheq" di cezayan de sepand. 9emîn Daîreya Cezayê ya Dadgeha Bilind ev biryar betal kir. Piştî biryara betalkirinê ya Dadgeha Bilind, bersûc Eren Ceylan, Murat Karataş û Murat Sonkur nehatin dîtin. Doz ji bo 3 bersûcên firar li 1emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê dihat dîtin.

Parêzer Şenal Sarihan di danişînê de axivî û got, "Ji bo van şahidên firar bên guhdarîkirin di dosyayê de bi hezaran delîl hene. Di derbarê radestkirina 3 bersûcan de em careke din bi hikûmeta Almanyayê re têkilî daynin. Ev kes bi awayekî rêxistinî birin derveyî welêt. Ev bi awayekî plankirî û organîze hatin kirin. [..] Tevî her tiştî em dixwazin heyeta dadgehê pêşî li wijdanê xwe binêre."

Ji parêzerên dozê Ozturk Turkdogan jî diyar kir ku li pêşiya radestkirina bersûcên fîrarî tu astengî nîne. Parêzer Ayça Çaglar, anî ziman ku divê sûcê ku hatiye kirin di pênaseya sûcê mirovahiyê de cih bigire û li ser demborîbûnê nîqaş neyê kirin. Piştî ku parêzeran îfadeyên xwe pêşkêş kirin, dadgehê hemû daxwaz red kirin û biryar da ku nêrînên di nameya ku ji Elmanyayê re hatiye nivîsandin ihsas-ı rey pêk nîne.

Dozgerê danişînê, der barê esasê de nêrîna xwe eşkere kir û diyar kir ku wexta demborîbûnê ya 30 salî bi dawî bûye, firartî nikare demborîbûnê rawestîne û ji ber vê yekê xwest doz bê betalkirin. Kesên ku li danişînê temaşe dikirin bertek nîşanî dozger da. Dadgehê biryar da ku ji ber demborîbûnê doz bê betalkirin.

*BBC Türkçe - https://www.bbc.com/turkce/articles/c1r522p9e4eo*

*Hürriyet - https://www.hurriyet.com.tr/gundem/sivas-katliami-davasi-zaman-asimina-ugradi-42330648*

**Tebinî ji dozên ku tên şopandin:**

**Doza Firat Akdeniz (6ê Îlonê, 2023, Diyarbekir)**

Di 17ê Tîrmeha 2017an de ji bo şermezarkirina ji kar avêtinên ji saziyên cemaweriyê yên bi Biryarnameya di Hukmê Qanûnê de ya bi hejmara 672an de çalakiya rûniştinê pêk hat. Der barê zêdeyî 30 kesên ku beşdarî xwepêşandanê bûne bi hinceta binpêkirina qanûna civîn û xwepêşandanan doz hat vekirin. Di nav wan de rêveberê berê yê Şaxa ÎHDê ya Amedê Firat Akdenîz jî hebû. Danişîna 5emîn a dozê di 6ê Îlonê de li 10emîn Dadgeha Cezayê Asliyê ya Amedê pêk hat. Ji ber dozger guherîbû, ji bo ku dozgerê nû dosyayê binirxîne û nêrîna xwe amade bike, rûniştin bo 29ê Îlona 2023an roja Înê hat taloqkirin.

**Doza Daxuyaniya Çapemeniyê ya der heq 6emîn Salvegera Komkujiya Pirsûsê de (12ê Îlonê, 2023, Îzmîr)**

Di 20ê Tîrmeha 2021î de gelek rêxistinên sivîl ji bo bîranîna 6emîn salvegera kesên di êrîşa çeteyên DAIŞê ya li Pirsûsê de jiyana xwe ji dest dabûn hatin gel hev. 10 kesên ku tev li daxuyaniya çapemeniyê ya bi dirûşma "Ji Pirsûsê re edalet, ji her kesî re edalet" bûn, bi îşkence û muameleya xerab ve hatin binçavkirin. Der barê wan de bi hinceta binpêkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan doz hatibû vekirin. Di 6emîn danişîna dozê de ku di 12ê Îlonê de li 10emîn Dadgeha Cezayê Giran a Karşiyaka ya Îzmîrê pêk hat de parastina bersûcan bi dawî bû. Ji bo ku dozger nêrîna xwe amade bike, rûniştina din a dozê dê di 12ê Kanûna 2023an de roja Sêşemê bê dîtin.

**Doza Eren Keskîn –I (13ê Îlonê, 2023, Stenbol)**

Der barê Seroka Giştî ya ÎHDê Eren Keskîn de bi hinceta ku di sala 2015an de di parvekirinên xwe yên li ser medyaya civakî de propagandaya rêxistina terorê û dijberiya qanûna civîn û xwepêşandanan kiriye, doz hat vekirin. Di Cotmeha heman salê de parêzerên ÖHD û ÇHDê ku di nav de Eren Keskîn jî hebû li ber Edliyeyê daxuyaniya çapemeniyê dan. Ji ber vê daxuyaniyê jî li parêzeran doz hat vekirin. Her du doz kirin yek. Di 31emîn danişîna ku di 13ê Îlona 2023an de li 13emîn Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê hat dîtin de, doz taloqî 8ê Mijdara 2023yan roja Çarşemê hat kirin da ku dozger biryara xwe amade bike.

**Doza Daxuyaniya Çapemeniyê ya SESê û Odeya Tabîban a Wan-Colemêrgê (15ê Îlonê, 2023, Wan)**

Di Sibata 2022an de koma ku di nav de hevserokên Şaxa SES'ê ya Wanê û Serokê Odeya Tabîban a Wan-Colemêrgê jî hebûn, xwestin daxuyaniya çapemeniyê bidin. Bi hinceta ku tevî hişyariyan kom belav nebûye û "Qanûna Civîn û Xwepêşandanan binpêkirine" li 1emîn Dadgeha Cezayê Giran a Wanê doz hat vekirin. Rûniştina çaremîn a ku di 15ê Îlonê de hat dîtin, ji bo sererastkirina kêmasiyan taloqî 8ê Adara 2024an hat kirin.

**Doza Fatma Yıldızhan (15ê Îlonê, 2023, Diyarbekir)**

Fatma Yıldızhan yek ji 24 parêzvanên mafan e ku di 16ê Adara 2022an de bi sûcdariya endamtiya rêxistina terorê hatin binçavkirin. Fatma Yıldızhan jî di nav de 11 kes ji wan hatin girtin. Fatma Yıldızhan sê mehan di girtîgehê de ma. Doza der heq Yıldızhan de li 10emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê vebû û di 21ê Cotmeha 2022an biryar hat dayîn ku bê rawestandin. Lê darizandin piştre dîsa dest pê kir. Di danişîna ewil de ku di 15ê Îlona 2023an de pêk hat, ji ber ku kiryara bersûc nehat îspatkirin, li gorî xala 223/2-e ya CMKyê biryara beraetê hat dayîn.